## Efrîn di bin dagîrkeriyê de (176):

## Gundê "Gundê Mezin", mirina yekî ji Hepsa "Çobanbegê - Elra'î" berdayî, li Bajaroka"Be'idîna" vêrgîlêxistin ji ber salên çûne ve, girtinên zordarane û qutkirina daran



















Ji bo wergirtina vêrgiyan ji Kurdên ku li Herêma Efrînê mane, milîs bi behane û sedemên rengereng û riyên xarûmaro, cûrbecûr şêweyên gef û tirsandinê bi kar tînin; Weke nimûne: Piştî ku hin rapor li ser ferzkirina Milîseyên "Feyleq Elmecid" tibabin mezin ji zeyta zêtûna li ser gundên "Kêla, Zerka, Çobana, Heyama, Su'iriya, Bêxçe, Elîbegê û hin din" û diyarkirina xelkê ji nerazîbûna xwe re, hin hevkarên xwe ji her gundekî agahdar kirin, ku divê vêrgiyan kom bikin, û veguhêsin derveyî gundan, da ku dûrî çavan radest bikin .

Vaye li jêr emê binpêkirin û tewanên rengereng belge bikin:

**= Gundê "Gundê Mezin:"**

Ji gundên kevnar e, tê de kevneşop û şikeftên dîrokî hene, bi /9/ KM an ji Bajarê Efrînê dûr e, ji/40/malî pêkhatî ye, dora/225/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, jê/27malbat=100nişte/man, û /10malbat=75nişte/ ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Milîseyên "Lîwa'i Elxab - Firqit Elhemzat" gund desteser kirin, dest danîn ser /6/malan tevî kelûpelên tê de, û ji malên din xwarinvexwarin, firaxên baqirî, alav û amûrên elektirîkê û hin tiştên din dizîn, û herweha jî guheztok (tirans) û keblên toreya elektirîkê ya giştî, û keblên toreya telîfonê ya zemînî .

Û li B.Efrînê milîseyan piştî penaberbûnê, tirektoreke çandiniyê ye "Ehmed Osman" tevî dûmahîkên wê, û /4/ matorên duloqî yên hemwelatiyên gund dizîn.

Weha jî Milîseyên "Elxab" avahiya dibistana gund kirin ciyê perwerdekirina çêlan, li ser xelkê gund (/500/teneke zêta zeytûna - /16/KG sade li ser werza sala 2019an Z, /250/teneke jî li ser werza 2020an Z) vêrgî ferz kirin, îsal jî werz tinebû ta ku tiştekî ferz bikin, û di navboriya herçar salên borî de jî, berhemên zeytûn, behîv, simaq, çiloyê reza, hejîr û gûzan dizîn.

Herweha jî wan ji bo êzingkirin û bazirganiyê, daristanên "Gûza Amê û li hemberê hirşê Çiyayê biçûk, Çiyayê Ristem" û darine sindîganê yên temenmezin qut kirin .

Û wan ji zû ve vêla "Ebid Elrehîm Henan (Rehîm)" kiribûn biryargeheke leşkerî, ta ku giropa "Lîwa'i Elxab - Mu'itez Elebdela" li Tebaxa 2021an, ji aliyê Firqê ve ji gund hate qewtandin, û xwediyê wê radest kir. Lê di dû re, li Berbanga 22.8.2021an Z, lawê xwediyê vêlê "Ridwan/50/sal", li nav zeviyeke wî ye zeytûna ye li ser riya ku dighêje Gundê "Dargirê" yê hevcîwar, li dema ku çûye bi tirektorê bajo, hate kuştin; Û hemî şopandinan nîşan dan ku "Mu'itez" ew tewana kiriye, ji ber ku pakrewanê vêguneh li hember dizîna wî ji kelûpelên malê re sekinî.

Divê were bîranîn jî ku hêzên Dagîrkeriya Turkiyê jî, li B.Efrînê dest danîn ser tevaya "Dibistana Ezhar Efrîn Elxase - Dibistana çîçekên Efrînê ya taybet" a Malbata "Rehîm" û ji xwe re kirin biryargeheke leşkerî.

Xelkê gund ên mane jî rastî cûrbecûr binpêkirin û tewanan hatin, jê girtinên bêsûcane, işkencekirin, kêmrûmetkirin, perestandin û hinên dî; Û ta niha çarenûsa Hemwelatî "Besam Ehmed Henan/35/sal" yê ji Avdara 2018an Z ve zorane veşartî, ne diyar e.

**= Mirina kesekî ji Hepsa "Elra'î" berdayî:**

Piştî ku li destpêka Avdara 2021an Z, ji Hepsa "Elra'î - Çobanbegê" ya navûdengbed a ku Milîseyên "Firqit Elsultan Mûrad" bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê bi rêve dibin hate berdan, û sê salan di ser girtin û veşartina wî ya zorane re derbas bûn, ji Avdara 2018an Z ve, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xwser a berê re; Hemwelatî "Mihemed Minle Elî kurê Ednên/28/sal - bavê zarokekî û ji xelkê Bajaroka Reco", ji ber işkencekirin û danûstandina sert a ku di hepsê de dîtiye - bê têkelî bi cîhana derve re, bi nexweşiyeke giran ket; Û li Roja Pêncşemê 16.12.2021an Z, piştî ku nexweşxaneyê Turkiyê hêvî ji çêbûna wî hate birîn, li malê hate vegerandin, bi şev jiyana xwe ji dest da, û li roja din jî termê wî hate binaxkirin.

**= Li Bajaroka "Be'idîna" hin vêrgîlêxistin ji ber salên borî ve:**

Piştî dawîkirina werza zeytûna ya îsal, "Ebsî Elhemed (Ebas) ji Gundê Sercê - Çiyayê Elzawiyê, Ebû Xalêd Elcebelî ji Gundê Cûzêf - Çiyayê Elzawiyê" ji serkêşên Milîseyën "Lîwa'i 112" li Bajaroka "Be'idîna", hin hemwelatî -bi behaneya ku ew endam in di PYD de, peyên rijîmê ne û li Heleb û Şehba'i rûdinin- neçar kirin ku vêrgiyan ji ber werzên îsal û salên borî ve (150 teneke zêt - her tenekak /16/KG sade) bidin wan, û hin ji wan jî Ev in: (Hesen Ebdo Mistefa ji ber Ebdîn Kekec Fata Sînê ve, Ristem Mistefa Fata Sînê ji ber Malbata Xelîl Kekec Fata Sînê ve, Mistefa Hec Hesen ji ber Malbata Dilovanber Mihemed Hemqaflo ve, Hesen Şe'iban ji ber birayê wî Reşîd ve, Hecî Hesen Bêrem ji ber xwîşka wî ve, Hisên Arêf Elo ji ber birayê wî Kemal ve, Ehmed Mûrad Hebeş ji ber birayê wî Hisên ve, Cemîl Elî Gurpe ji ber bavê hevjîna wî ve); Divê were zanîn ku ew koçberên zorane ne, û malmewalên hinekan jî hîn bi hev de ne û nehatine parvekirin, bi ser de jî pereyên ku li xizmetguzariyê dane xerckirin; Û wan milîseyan piştî du salan ji xizmet û xerciyan, berhemên /250/darên zeytûnê yên weresên "Menan Hişîno Hecî" yên ne li wir -di nav de jî sêwî- û hemwelatî "Mihemed Osman" ji ber xwe ve dînane ku malmewalên wan hilîne û dîne, û /100/ dar jî yên "Hesen Heyder Hebeş" ê ku li bajarokê ye.

Herweha yê ku bi "Ebas" tê navdan li hemwelatî "Hisên Arêf Ebdo" xist, ji ber ku wî nerazîbûna xwe ji dandina vêrgiyê re da nîşandan, û weha jî dest danî ser herdu makînên "Hesen Şe'iban û Mistefa Hesen Şe'iban", ta ku vêrgiyên xwe radest dikin.

Weha jî serkêşê Lîwa'ê "Ebid Elkerîm Cemal Qesûm" xwediyên herçar guvêşgehên zeytûna yên bajarokê neçar kirin, ku bêrîna zeytûna ya dora/1000/tonî radestî nûnerê wî bikin, û paşê ewê nirxê wê li dawiya mûsimê - buhayê her tonekê kêmtirî buhayê ku kargehên bêrînê li herêmê dikirin bi/10/dolaran- bide wan, da ku ew li dawiyê dora /10/hezar dolarî wek qezenc werbigre.

Û berê jî ji çar salan ve wan milîseyan dest danîbûn ser /200/darên zeytûnê yên Dilovanber "Elî Reşîd Elî", /150/dar ên "Hisên Mûrad Hebeş", /90/dar ên "Mihemed Hebeş Hebeş", /100/dar ên "Xelîl Ebdela", /80/dar ên Dilovanber "Hisên Osman Hecî", /225/jî yên "Mihemed Ehmed Şe'iban"; Û li vê dawiyê jî wan hin şûngirên hemwelatiyên ku ne li bajarokê qedexekirin ku malmewalên wan bi rêve bibin, û kokên/250/ darên zeytûnê yên "Rukin Eldîn Bekir Mihemed" jî -weke nîşanekê ji destdanîna ser re- boyax kirin .

Û bi şopandin û hûrgilîkirina ji malmewdanên hemwelatiyên ne li bajarokê re û ferzkirina vêrgiyên nû li ser wan, Milîseyên "Elîwa'i" û serkêşê wê "Qesûm" dil hene ku dest dînin ser tevahiya wan malmewalan.

Û divê were bîranîn ku li vê dawiyê "Ebas û Elcebelî" ji alîkariyên diravî yên ku ji xelkê bajarokê re, ji aliyê rêxistineke fîxaniyê ve têne dandin, bi behaneya peydakirina parên xwarinvexwarinê ji malbatên ku di belavkirinên berê de hatine bêparkirin re, rêjeyek qut kirin. Lê, wan beşê mezintirîn ji yê hatiye komkirin ji xwe re birin.

Û "Ebas" bi endamin din re, gelek cîgeh di nav zeviyên zeytûnan de, li dorahiya aliyê Başûr ji bajarokê re, ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan, kolan û tevadan û hîn jî berdewam in.

Ma "Komîta Vegerandina Mafan" li Efrînê û Hemahengiya Sûrî - Ixwanî dikanin lêpirsînê bi wan kesan re bikin, û tiştên hatine dizîn li xwediyan vegerînin؟!

**= Girtinên bêsûcane:**

-Li 9.12.2021an Z, Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" li Efrînê, Hemwelatî "Ferat Zaza/30/sal - ji du heyvan ve zewicî" ji xelkê Gundê "Alciya" - Navça Şera, li Gundê "Maratê" rûdine û xwediyê cîgeheke çêkirina solan e- girt, Piştî ku wî li dijî çekdarine ku di ciyê karê wî de êrişê kirine, li ber xwe da.

-Li 12.12.2021an Z, Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên Asayêşa Mabeta ev hemwelatî "Ferîd Ehmed Mistefa/47/sal – bi (Nîdal) tê naskirin û ji Gundê Emara, Bêrem Ico Mistefa/48/sal ji Gundê Şêxotka, Cîhad Mihemed Mensor/50/sal" bi tewanbariya têkeliyê bi R.X a berê re girtin, û li Roja Pêncşemê 16.12.2021an Z berdan, piştî ku her yekî /1200/PT da.

**= Qutkirina daran:**

Li ba çekdar û anîndeyên ji milîseyan ve palpişt, ji bo êzingkirin, çêkirina komirê û bazirganiyê, qutkirina daran bûye tiştekî asa û rêbazkirî; Hema li Gundê "Kîmarê" - Şêrewa, li vê dawiyê Milîseyên "Firqit Elhemzat" dora du hezar darên zeytûnê yên "Ezet Mamo Nebo, Michim Reşîd Elo Nebo, Eynat Mamo Nebo, Nîdal Cimo Nebo, Xazî Mamo Nebo, kurên Şahîn Nebo" qut kirin.

Heya ku Turkiya Dagîker a serperşt siyast û kiryarên dijmantiyê li dijî Herêma Efrînê û xelkê wê pilan dike û dide wênekirin, bi hin perspankirinên ji bo xweşikirinê û rakirina hin zordariyan, kêşeya wan a bi'êş û xembar çareser nabe. Çareserî tenê di dawîkirina hebûna dagîrkeriyê û milîseyên nandoz de, û di vegera Efrînê ji serweriya Sûriyê û rêvebiriya xelkê wê de ye .

19.12.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Daristana "Gûza Amê" - "Gundê Mezin" - Efrîn ji berî qutkirinê.
- Pakrewan "Ridwan Ebid Elrehîm Henan".
- Girtiyê ku çarenûsa wî ne diyar "Besam Ehmed Henan".
- "Ebsî Elhemed(Ebas), Ebû Xalêd Elcebelî" ji serkêşên Milîseyên "Elîwa'i 112" li Bajaroka "Be'idîna".
- Dilovanber "Mihemed Minle Elî kurê Ednên" ê ku ji Hepsa Elra'î hatiye berdan.